

# MÎRATEYA TERORÊ:

## REWŞA XIRAB A ZAROKÊN ÊZIDÎ YÊN JI DÎŞI'YÊ RIZGARBÛYÎ

AMNESTY INTERNATIONAL

**Amnesty International is a global movement of more than 7 million people who campaign for a world where human rights are enjoyed by all.**

**Our vision is for every person to enjoy all the rights enshrined in the Universal Declaration of Human Rights and other international human rights standards.**

**We are independent of any government, political ideology, economic interest or religion and are funded mainly by our membership and public donations.**

© Amnesty International 2020
Except where otherwise noted, content in this document is licensed under a Creative Commons (attribution, non-commercial, no derivatives, international 4.0) licence.
https://creativecommons.org/licenses/by-nc-nd/4.0/legalcode
For more information please visit the permissions page on our website: www.amnesty.org
Where material is attributed to a copyright owner other than Amnesty International this material is not subject to the Creative Commons licence.
First published in 2020
by Amnesty International Ltd
Peter Benenson House, 1 Easton Street
London WC1X 0DW, UK

**Index: MDE 14/2759/2020**
**Original language: English**

**amnesty.org**

AMNESTY INTERNATIONAL

# 1. KURTEYA REVEBERIYÊ

> **“‘Ezê çi carî tişta hatî serê min ji bîr nekim. Ew parçeyeke min e, wek nîşanekê. Ew her tim li vir e. Ew tişta herî xirab e ku bê serê mirovekî, tişta herî bêrûmet e. Dema ez vegeriyam… tu kesî piştgirî neda min, tu kesî destê xwe dirêjî min nekir. Tişta ku ez li bendê bûm hema ew bû ku kesek li min xwedî derketa, hinek alîlkarî bû, ji min re bigota ku, 'Ez li vir im ji bo te.' Yekî destê xwe daniya ser milê min û bigota ku her tişt ê çareser be… Ew bû tişta ku ez li bendê bûm, lê min ew çi car nedît.”**
>
> Sahir, leşkerê zarok ê berê yê DÎ'yê

Di navbera 2014 û 2017'an de koma çekdar a ku xwe wek Dewleta Îslamî (DÎ) bi nav dikir sûcên şer û sûcên dijî mirovahiyê pêk anîn li hember civaka Êzidî ya li Iraqê. Komîsyoneke Lêkolînê ya NY'ê gihîşt vê encamê ku DÎ'yê li hember civaka Êzidî di asta jenosîdê de çalakî pêk anîne. Zarokên Êzidî ji aliyê DÎ'yê ve hatin revandin û kolekirin, hatin êşkencekirin, bi zorê ew beşdarî şer kirin, hatin tecawizkirin û bûn mijara binpêkirinên gelek xirab ên mafan. Ji aliyekê ve bi hezaran zarok hatin kuştin an jî revandin, bi sedan jî rizgar bûn û vegeriyan li ba malbatên xwe yên li Iraqê. Dîsa jî hatina wan a malê dawiya êş û azarên wan neanî.

Piştî ku vegeriyan malbat û civaka xwe, ew zarokên rizgarbûyî rastî gelek zehmetiyan hatin. Tenduristiya wan a fîzîkî pir xirab bû; gelek ji wan pirsgirêkên tenduristiya derûnî dijîn; ew carinan bi dîyalekta Kurdî ya ku dêûbavên wan diaxivin nikarin biaxivin an jî jê fêm nakin; gelek ji wan nikarin qeyda xwe ya dibistanê çêbikin piştî windakirina çend salan; û ew di bidestxistina belgeyên sivîl ên nû an jî di guhertina wan belgeyan de rastî astengiyan tên, ku ew belge li Iraqê pir girîng in ji bo bidestxistina mafên sereke û sûdên bingehîn.

Jinên Êzidî jî ên ku ji hêla DÎ'yê ve hatin revandin û di encama tundiya cinsî de zarok anîn rastî zehmetiyên mezin tên. Gelek ji wan bi zorê ji zarokên xwe hatin veqetandin ji ber zextên dînî û civakî û lewre di rewşeke pir xirab a derûnî de ne.

Li gor qanûna navnetewî, hemû zarok bêyî tawanbarî xwedî mafên tenduristî, perwerdehî, nasnameya fermî û yekîtiya malbatê ne. Zarokên ku bûne qurbaniyên binpêkirinên mafên mirovan û qanûnên navnetewî yên mirovahiyê xwedî heqê tezmînatê yê tam in. Lêkolîna Rêxistina Efûya Navnetewî nîşan dide ku rayedarên hikumeta navendî ya Iraqê û Hikumeta Herêmî ya Kurdistanê (HHK) ji bo zarokên rizgarbûyî yên Êzidî di garantîkirin û hurmetgirtina wan mafan de û di misogerkirina tezmînatê de dikeve nav kêmasiya



AMNESTY INTERNATIONAL

bicihanîna berpirsiyarên xwe. Bêyî guherîneke berbiçav a polîtîka û pêşekiyên rayedarên netewî, ya bi piştgiriya civaka navnetewî, ew zarok ê bi berdewamî rû bi rûyî mîrateyê sûcên DÎ'yê bên bêyî ku piştgiriya pêwîst bi dest bixin ku ew piştgirî jî mafê wan e.

Rayedarên netewî û civaka navnetewî divê demildest tevbigere da ku jinan bi zarokên wan ên bi tundiya cinsî çêbûyî bigihîne hev, veqetandinên li pêşerojê asteng bike û pêşekiyê bide wan jin û zarokan ji bo ji nû ve bicihkirinê an jî niştecihkirina mirovî.

Lêkolîna ji bo vê raporê di navbera Reşemî û Tîrmeha 2020'an de hat meşandin. Nûnerên Rêxistina Efûya Navnetewî li Herêma Kurdistanê ya Iraqê (HK-I) ji 17'yê ta 27'ê Reşemiyê xebata qadê pêk anîn. Di heyama vê mîsyonê de, nûneran li gel malbatan hevdîtin çêkirin ku li hundir û nêzikî du qampên ji bo koçberên navxweyî yên ku navçeya Duhokê ya KR-I yê dijiyan. Hevdîtinên mayî jî bi rêya hevpeyvînên dûr ên bi rêya amrazên dîtbarî hatin çêkirin. Bi tevahî, Rêxistina Efûya Navnetewî bi 29 kesên rizgarbûyî yên ku ji hêla DÎ'yê wek zarok dîl hatibûn girtin, bi 25 endamên malbatê ku zarokên rizgarbûyî xudan dikin û bi 69 takekesên din re hevpeyvîn çêkir, ku di nav wan de xebatkarên endamê rêxistinên civaka sivîl ên lokal û navnetewî (RCS); Rayedarên NY'ê; rayedarên hikumetê; bijîşk; psîkolog û psîkoterapîstên ku zarokên rizgarbûyî ên ji hêla DÎ'yê dîlgirtî tedawî kirine û bi wan re xebitîne; rojnamevan û pisporên ku derbarê civaka Êzidî de xwedî zanyarî ne; û temsîldarekî serokê dînî ê Êzidiyan Baba Şêx.

Di 7ê Tîrmeha 2020'an de, Rêxistina Efûya Navnetewî keşfên xwe yên sereke ku bi hûrgilî di vê raporê de derbas dibin bi nameyan ji Serokwezîrê Îraqê Mustafa Al-Kadhimi re, ji Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî re û ji Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî re şand û xwest ku ew rayedar bersivekê bidin. Heya 24ê Tîrmeha 2020'an çi bersiv nehat, dema ku ew rapor hat timamkirin.

## DIJWARIYÊN JI BO ZAROKÊN RIZGARBÛYÎ

Gelek zarokên rizgarbûyî dema vegeriyan malbatên xwe di rewşeke birçîmayî, êşkencekirî de bûn an jî hatibûn mecbûrkirin ku li hember hovîtiyan li ber xwe bidin an jî beşdarî wan hovîtiyan bin. Di gelek bûyeran de, wan tecribeyan li ser tenduristiya wan bandoreke mezin çêkiribû. Her ku hin zarok bi rewşên ku dikarin bên tedawîkirin bi şûn de hatibûn wek nexweşiyên bêxwînî û gurîbûnê, yên din xwedî birîndariyên lawazker ên dem-dirêj, nexweşî an jî rewşên giran bûn. Wek encama beşdarbûna nav şer, kurikên ku bi zorê ji hêla DÎ'yê ve wek leşker hatibûn gihandin bi taybetî xwedî rewşên giran ên tenduristiyê û seqetiya fîzîkî bûn, wek windakirina mil û lingên xwe ya di şer de. Keçikên rizgarbûyî yên ku rastî tecawiz û tundiya cinsî hatine pisgirêkên tenduristiyê yên xweser dijîn, ku di nav wan de trawmaya fîstulayî; şûna birînan; û dijwariyên dema avisbûnê û zarokanînê de derkevin holê hene.
Piraniya zarokên rizgar bûyî û xudankerên wan ên ku bi wan re hevpeyvîn hatin çêkirin, û her wisa gelek xebatkarên karên mirovî, gotin ku pêwîstiyên tenduristiyê yên zarokên rizgarbûyî heya niha nehatine pêkanîn, bi taybetî jî pêwîstiyên derbarê rewşên tenduristiyê yên dem-dirêj ên giran û rewşên birîndariyê. Bûyera Rayan, ku di temenê 15 salî de bi zorê ji hêla DÎ'yê ve wek leşker hatibû gihandin, mînakeke tîpîk e. “Min eniya pêş diparast [û] ez bi gulleyekê [topê] birîndar bûm," wî wisa behs kir. "Di nav lingê min ê rastê de şarapneleke mezin heye, li pişta çoka min… Ev şarapnel hema di nav bedena min de maye. Ew bû sê sal ez bi şûn de hatime, û çi tişt [çi tedawî] nekirine.”

Zarokên rizgarbûyî yên ku ji dîlgirtinê vegeriyane trawmayên erjeng derbas kirine. Hema her xudankerê ku pê re hevpeyvîn hat çêkirin got ku tenduristiya derûnî ya zarokê ku ew xudan dikin bandor ji dema dîlgirtinê dîtiye. Her ku rewşa her takekesî cuda be jî, pisporên tenduristiya derûnî hin qalibên hevpar kifşe kirine, û derxistine holê ku rewşên herî zêde di nav zarokên rizgarbûyî yên Êzidî de tên dîtin ên wek nexweşiya zexta piştî trawmayê (PTSD), endîşe û depresyon e. Semptom û tevgerên ku ji hêla zarokên rizgarbûyî ve tên nîşandan ên wek hêrsbûn, hîperaktîvîte, bibîranîn, qabûsên domdar, bin-şilkirin, xwe vekişandina ji rewşên civakî û guherîna nişkav a rewşa ruhî ye.

Her aktorê karê mirovî ku ji bo vê hevpeyvînê bi wan re hevdîtin hat çêkirin ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku xizmetên psîkososyal û bernameyên heyî yên ji bo zarokên rizgarbûyî yên Êzidî bi têra maf û pêwîstiyên wan zarokan nakin. Her wekî xebatkarek karê ciavkî ê ji Yazda'yê, rêxistineke alîkariya mirovî ku ji bo civaka Êzidî alîkariyê dabîn dike, got, "Rast e ku hin rêxistin li ser vê tiştê dixebitin, û çi tiştê em bikarin em dikin, lê ji wan zarokan re zêdetir, hîn zêdetir tişt lazim in." Xebatkarên karê mirovî û pisporên tenduristiya derûnî di heman demê de girîngiya bilindkirina qalîteya xizmetên heyî, guhestina helwestên dem-kurt ên gelek rêxistinan bi yên dem-dirêj, yên bi nêzikbûnên tevahî, ku bi stratejiyeke berfireh bê birêvebirin, destnîşan kirin.

Xebatkarên karê mirovî, pisporên tenduristiya derûnî û xudankeran di nav gelek binpêkirinên mafên mirovan de pirî caran qala dijwariyên taybet ji bo du cure zarokên rizgarbûyî kirin: zarokên ku kiribûn leşker û keçikên bûne mijara tundiya cinsî. Kurikên Êzidî ku bi zorê ji hêla DÎ'yê ve kiribûn leşker bi mehan heta bi salan rastî propagandayeke giran hatin, hîndariya bîrdozî û leşkerî dîtin, bi zanetî nasnameya wan a berê, ziman, dîrok, çand û heta navên wan bi wan dan jibîrkirin. Piştî ku ji dîlgirtinê bi şûn de vegeriyan, têkiliya wan a bi endamên malbatê û civakê bi tengeje bû, û carinan digihîşt radeya gefxwarin û acizkirina kurikên din. Ji nîvê zêdetir ê 14 zarokên leşker ên berê ku ji bo vê raporê hevdîtin bi wan re çêbû gotin ku wan bi çi şiklî piştgirî – çi piştgiriya psîkososyal, tenduristî, aborî an jî bi awayekî din – nestandine piştî vegera xwe.

Keçikên Êzidî di dema dîlgirtina ji hêla DÎ'yê de tundiya cinsî jî tê de rastî gelek cureyên destdirêjiyê hatine. Bijîşkeke ku ji bo bi sedan jin û keçikên Êzidî yên rizgarbûyî alîkariya tibî dabîn dike ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku hema hema her keçên temenê wan navbera 9 û 17 salî ku wî tedawî kiriye hatiye tecawizkirin an jî tûşî tundiyên din ên cinsî bûye. Dîsa jî li gor xebatkarên mafên mirovî û

pisporên din, xizmetên heyî û bernameyên ji bo kesên ji tundiya cinsî rizgarbûyî girîngî nedane keçikan, zêdetir bala xwe dane ser jinên rizgarbûyî. Wan pisporan pêşniyara xizmetên tenduristiya derûnî û piştgiriya psîkososyal kirin da ku maf û pêwîstiyên taybet ên wan keçikan bên çareserkirin. Bernameyên bi vî awayî divê bersivê bidin hemû destdirêjiyên ku wan keçikan li dema dîlgirtinê de jiyane.

Gelek zarokên rizgarbûyî piştî ku vegeriyan astengiyên berbiçav ên zimanî dibînin, ku ew jî pêşî li wan digire ku bi malbat û civaka xwe re ji nû ve entegre bin. Her ku hin zarok dikarin bi dîyalekta Kurmancî ya zimanê Kurdî bi awayekî herikbar biaxivin jî, yên din piştî vegera ji dîlgirtinê nikarin bi Kurdiya Kurmancî biaxivin û heta nikarin fêm bikin jî. Piraniya wan zarokan niha wek zimanê esasî bi Erebî diaxivin. Aktorên karên mirovî, zarokên rizgarbûyî û xudankerên wan ên ku ji bo vê raporê hevpeyvîn bi wan çêbû gotin ku ji bo wan çi derfet tunebûn ku ji wan re bibin alîkar da ku ji wan astengiyên ziman re çareseriyê bibînin û ji wan xilas bibin.

Zarokên rizgarbûyî di gehîna perwerdehiyê de rastî astengiyan tên. Her çiqas gelek zarokên koçberkirî yên li Iraqê nekaribin xwe bigehînin perwerdehiyê jî, Êzidiyên rizgarbûyî rastî zehmetiyên taybet tên, ji ber ku wan yek an jî zêdetir salên dibistanê winda kirine ji ber rewşa dîlgirtinê. Rayedarên hikumetê û Rêxistinên Civaka Sivîl (NGO) ên netewî û navnetewî bi rêya bernameyên hînkirina lezgîn hin gav avêtine da ku wan ji nû ve bixin nav pêvajoya sîstema perwerdehiyê. Gelek zarokên rizgarbûyî, disa jî, di wan bernameyan de nehatine qeydkirin, ji ber ku an nizanin ku bernameyên wiha hene an jî ji ber ku ew ancax bi rêya derbaskirina astên bilind ên bûrokrasiyê û tijîkirina gelek kaxezan û serlêdana li ba gelek saziyên hikumetê dikarin xwe bigihînin wan bernameyan. Wek encam, gelek zarokên rizgarbûyî bi timamî li derveyê sîstema perwerdehiyê diminin.

Dîsa jî, li gor çend pisporên tenduristiya derûnî ên ku ji bo vê raporê bi wan re hevpeyvîn hat çêkirin, berdewamkirina bi dibistanê girîng e ji bo alîkarbûna bi wan zarokan da ku trawmaya di dîlgirtinê de rû bi rû mane bikarin sereder bikin. Nahla, rizgarbûyî ya 16 salî, girîngiya dibistanê ji bo ji nû ve entegrebûna xwe anî ziman: "Piştî ez zivirîm dibistanê, tişt bêtir normal bûn, û min xwe baştir hîs kir. Ji bo pêşerojekê pêwîstiya we bi dibistanê heye."

Zarokên rizgarbûyî li heman demê tûşî astengiyên berbiçav dibin di bidestxistina belgeyên fermî yên nû an jî di guhestina wan de, yên wek kartên nasnameyê, kartên niştecihbûnê, qarne û sertîfîkayên jidayîkbûnê. Li Iraqê belgeyên bi vî awayî yên bingehîn in da ku mirov bikarin mafên mirovî yên sereke bi kar bînin wek azadiya hatin û çûnê û gehîna bi perwerdehiyê. Zarokên rizgarbûyî û kesên xudankerên wan gotin ku pêvajoya bidestxistina wan belgeyan mesrefê dixwaze, dem digire û gelek caran jî rêwîtiya ber bi herêmên ku ew ewle nabînin pêwîst dike, cihên wek Mûsil û Sîncar.

## DIJWARIYÊN JI BO ENDAMÊN MALBATÊ YÊN ZAROKÊN RIZGARBÛYÎ

Dêûbav û endamên malbatê yên ku zarokên ji dîlgirtina DÎ'yê rizgarbûyî ji Rêxistina Efûya navnetewî re gotin ku wan di pêkanîna pêwîstiyên wan zarokan de zehmetî kişandine. Gelek malbatên Êzidî feqîr bûne – qismek jî ji ber ku wan bi hezaran heta bi deh hezaran dolar pere wek fîdye dane ji bo ku wan zarokan û endamên din ên malbatê ji dîlgirtina DÎ'yê rizgar bikin. Xebatkarên karê mirovî her wisa tunebûna bernameyên ji bo perwerdekirina dêûbav û xudankeran ragihandin ku derbarê tiştên zarokên wan dijîn, an jî derbarê bê ka çawa piştgiriyê bidin zarokan piştî vegera wan a ji dîlgirtinê ji wan re bibin alîkar.

Têkildarî gelek dijwariyên ku zarok di entegrebûnê de dijîn û rewşa bi zehmetî ya xudankirina wan zarokên rizgarbûyî, çend xudankeran neçariya rewşê anîn ziman. Wek mînak, Arzan, ê ku kurê wî yê 14-salî pir hêrs dibe, hîperaktîf e û xwedî helwestên hêrsok e, ji Rêxistina Efûya Navnetewî wiha got: "Li destpêkê, min xewn didît ku ew vedigeriya li ba min. Piştre gava ew vegeriya û hat, min bi wî re qet daneke normal derbas nekir, qet bîskeke normal derbas nabe… Çi tişt ji wê xirabtir nabe."

Rewşa jinên Êzidî yên ku di encama tundiya cinsî ya ji hêla DÎ'yê de zarok anîne pêwîstî bi baldariya acîl a rayedarên netewî û civaka navnetewî dibîne. Wek encama polîtîkayên DÎ'yê yên tecawiza sîstematîk û kolekirina cinsî, jinên Êzidî bi sedan zarok anîn dinê di heyama dîlgirtina xwe de. Ji ber sedemên gelek faktoran, di serî de jî ji ber helwesta Meclîsa Rûhanî a Bilind a Êzdiyan ku fermanê dide ku çi zarokên ku bavên wan Misilman an jî "neyê zanîn" divê wek Misilman bê qeydkirin, ew zarok di nav civaka Êzidî de nayên pejirandin. Lewre ew jin hatin mecbûrkirin ku an zarokên xwe xudan bikin bes terka malbatên xwe bidin, an jî terka zarokên xwe bidin da ku bi malbat û civaka xwe re dîsa bibin yek.

Li gor çalakvanên civaka sicîl û xebatkarên endamên rêxistinên mirovî yên lokal û navnetewî, berteka civaka Êzidî ya derbarê wê pirsgirêkê tevlihev e. Her ku gelek mirovên di nav civakê de bi awayekî tund li dijî qebûlkirina wan zarokan in ku di encama tundiya cinsî de hatine dinyayê, yên mayî dil hene ku wan qebûl bikin, bi taybetî jî eger nîşaneyeke erênî ji rayedarên dînî bibînin. Dîsa jî mirovên mayî ji bo wan jinan û zarokên wan xwedî hezkirin in û di vê baweriyê de ne ku divê ew alîkariyê bibînin, lê li gor rê û rismên Êzdiyatiyê, ew nikarin di nav civakê de ji xwe re cihekê bibînin.

Gelek ji wan jinan di rewşên neçar de ne, di hin bûyeran de tê dîtin ku ew êşeke derûnî dikêşin piştî ku bi zorê ji zarokê xwe hatine veqetandin, û hinekên din jî, li qampên Koçberan an ji bi girtiyên DÎ'yê dimînin da ku terka zarokên xwe nekin. Çend jinên wiha ku ji hêla Rêxistina Efûya Navnetewî li gel wan hevpeyvîn hat çêkirin gotin ku ew dane zorê, mecbûr hîştine an jî hatine xapandin ji aliyê endamên malbatê an jî ji aliyê takekes an jî komên mirovan ên ku hewl didin jin û zarokên Êzidî bigihînin malbatên wan, da ku zarokên

xwe di şûn de bihêlin. Wan her wisa got ku wan kesan ew bi derewan îqna kirine ku ew ê di rojên pêş de bikarin zarokên xwe bibînin û bigihîjin zarokên xwe.

Hanan, jina 24 salî ya ji dîlgirtina DÎ'yê rizgarbûyî, ji Rêxistina Efûya Navnetewî got: “Mamê min li ser şeref û namûsa xwe soz da min ku çi wextê ez bixwazim êzê bikarim serlêdana keça xwe bikim. Min ew bir danî sêwîxaneyê. Wextê min ew danî li wir ez ji wan re qîriyam û min got 'Zaroka min nedin tu kesî. Ezê her hefte, her heyv dîsa werim, – ew rewş ê derbas be!' Wextê min mamê xwe dît, gotinên wî yên ewilî ew bûn, 'Keça xwe ji bîr bike.'"

Sana, jina 22 salî ya ji dîlgirtina DÎ'yê rizgarbûyî, keçika xwe bi xwe bir qampa Koçberên Navxweyî, lê mecbûr ma ku terka wê bike piştî ku bi dubareyî gefên kuştinê li wê kirin. Wê got: "Min ew bir ofîsê [Rêxistinek Sivîl a lokal], û wan gote min ku ez keça xwe bihêlim… Wan got: ‘Emê ji bo wê bibin dê û bav.’ Tam di vê wextê de min wisa hîs kir ku hestiyê pişta min şikest. Gewdeya min rûxiya.”

Hemû jinên ku hevpeyvîn bi wan re hat çêkirin ên ku ji zarokên xwe hatin veqetandin gotin ku wan nekariye xwe bigihînin zarokên xwe, an jî rêyeke danûstandinê nedîtine û ne jî agahî ji wan standine. Wan her wisa got ku wan nekariya derbarê daxwaza xwe gihîştina bi zarokên xwe li gel malbat û civaka xwe biaxivin, ji ber fikarên têkildarî ewlehiya xwe.

Trawmaya ku ew malbat ji ber veqetîna ji dê û bavên xwe dijîn hîn zêdetir acizî bi xwe re anîn: gelek ji wan hatin zorlêkirin da ku terka zarokên xwe bikin an ji bo berdana wan hatin xapandin; bi çi awayî nikarin bi wan têkiliyê çêbikin; derbarê siheta wan çi agahî nestandin; di nav malbat an jî civaka xwe de nikarin hîsên xwe yên derbarê xemgîniya xwe parve bikin; di vê mijarê de çi alîkariya psîkososyal nestandine; û çi piştgirî nedane wan da ku bi zarokên xwe re bên li ba hev û di vî warî de jî hêvîyeke wan pir kêm e.

Çend jinên ku bi wan re hevpeyvîn hat çêkirin got ku wan hewl daye xwe bikujin. Hinekan ji yek carê zêdetir ew tişt pêk anîne. Hemûyan jî lavahî li civaka navnetewî û rayedarên netewî kirin ku zûka bikevin nav tevgerê, ji ber ku nikarin tabetiya rewşa xwe bînin. Janan, a 22 salî ya ji dîlgirtina DÎ'yê rizgarbûyî, ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got: "Ez dixwazim ji [civaka xwe] re û ji her kesê cîhanê re bibêjim ku, ez bextê we me ku me qebûl bikin, û zarokên me qebûl bikin. Em ji DÎ'yê rizgar bûne. Êşa me kişandî bidin ber çavê xwe… Min nedixwest bebikek min ji wan mirovan çêbe. Ez mecbûr kirim ku kurekê bînim. Ezê çi car nexwazim ku bi bavê wê re bijîm, lê ez hewce dibînim ku bi kurê xwe re bijîm.

## ÇALAKIYÊN PÊWÎST

Rayedarên netewî misoger bikin ku kurik û keçikên rizgarbûyî, û her wisa xudankerên wan jî, daxilî nav pîvanên tezmînatê bikin ku ji bo qurbaniyên Êzidî yên bûne qurbaniyên DÎ'yê hatine terxankirin. Ji bo ku berpirsiyariyên xwe yên derbarê wan zarokan pêk bînin, divê ew, bi piştgiriya tevkaran, rêxistinên navnetewî û RSS'yan, bi taybetî çareseriyê ji bo tenduristî û pêwîstiyên psîkososyal ên wan zarokan bibînin; cihê ku lazim bike perwerdehiya Kurdiya Kurmancî bidin wan; derfetên ji bo xwe gihandina bernameyên perwerdehiyê yên lezgîn bi awayekî berfireh dabîn bikin; astengiyên li pêş bidestxistina belgeyên sivîl ên nû an jî derfetên veguhestina wan ji holê rakin; û piştgirî û perwerdehiyê bidin wan hemû xudankerên ku xwedî li zarokên rizgarbûyî derdikevin. Ji bo zarokên rizgarbûyî yên seqetmayî, seqetiyên fîzîkî û psîkososyal jî tê de, rayedar divê misoger bikin ku ew bêyî tawanbarî bikarin bigihîjin hemû mafên xwe, ku tê de mecbûriyeta dabînkirina avahiyên bikêrhatî jî heye.

Rayedarên hikumeta navendî ya Iraqê û yên HHKê, bi xebata li gel rêxistinên navnetewî û RSS'yan, divê gavên pêwîst bavêjin da ku rewşa jinên Êzidî yên ku zarokên bi tundiya cinsî ya ji hêla endamên DÎ'yê anînê dinyayê çareser bikin. Ji her tiştî bêtir, ji jinên Êzidî yên ku dixwazin bi zarokên xwe re bimînin an jî bigihjin zarokên xwe destûr divê bê dayîn, alîkariyê bidin wan û piştgiriya wan di vî warî de bê kirin, û veqetandinên pêşerojê yên wan jin û zarokan bên astengkirin. Saziyên navnetewî yên wek Komîsyona Bilind a Penaberan a NY'ê (UNCHR) divê bi hikumetên biyanî re tevkariyê bike da ku pêşekiyê bidin wan jin û zarokan û rewşa wan zûka bê şopandin ji bo ji nû ve bicihkirinê an jî niştecihkirina mirovî. Rayedarên Iraqî divê hemû qanûnên Iraqê yên têkildar biguherînin da ku jinên Êzidî yên xwedî zarokên bi tundiya cinsî çêbûne bikarin dînê ku zarokên wan jêr hatine qeydkirin vebijêrin. Û rêxistinên navnetewî û RSS divê misoger bikin ku jinên xwedî zarokên bi tundiya cinsî çêbûne yên ku li qampên penaberan ên li Suriyê dijîn jî ji mafên xwe yên mayîna bi zarokên xwe agahdar bin û ji bo saziyên navnetewî yên wek UNCHR bên sewqkirin da ku ji nû ve bên bicihkirin.

Digel ku qabûsa revandina ji hêla DÎ'yê, kolekirin, êşkence û destdirêjiyên din ji bo zarokên Êzidî yên rizgarbûyî û ji bo jinên xwedî zarokên bi tundiya cinsî çêbûne bi dawî hatibe jî, zehmetiyên wan hîn jî didomin. Rayedarên netewî divê niha berpirsiyariyên xwe bi cih bînin, tezmînatên ku dê piştgiriyeke watedar, kêrhatî û dem-dirêj dabîn bikin jî di nav de.

# 2. PÊŞNIYARÎ

## JI RAYEDARÊN HIKUMETA NAVENDÎ YA IRAQÊ Û HIKUMETA HERÊMA KURDISTANÊ RE

### BERPIRSIYARÎ, EDALET Û TEZMÎNAT

- Gavên acîl bên avêtin da ku zarok, jin û mêrên Êzidî bên kifşekirin; gorên komî bên vekirin; û ji bo pêkanîna wan kar û baran fonên zêdetir ji dezgehên hikumetê re bên terxankirin;
- Dadgehkirina hemû wan kesan, a bi dadgehên heqanî ku cezayê îdamê li derve dihêle, ku derbarê wan de şahîdiyên tawanbariyê yên diyar hene ku li hember civaka Êzidî, sûcên li hember zarokan hatine kirin jî tê de, li gor qanûnên netewî berpirsiyar in;
- Guhertina qanûna navxweyî ya Iraqê da ku binpêkirinên qanûna navnetewî, ku sûcên şer, sûcên li hember mirovahiyê û jenosîd jî di nav de, tê de cih bigirin; û
- Sazkirina pîlansaziyeke kêrhatî da ku ji bo qurbaniyên binpêkirinan ên dema arîşeyên DÎ'yê tezmînata tam bê dabînkirin, ku tê de berdêldayîn, lêvegeran, rehabîlîtasyon, tetmînkirin û misogerkirina ne-dubarebûnê hebe. Wek beşeke pîlansaziyeke wiha:
  - Misoger bikin ku qurbanî, kurik û keçik jî di nav de, beşdar bibin amadekirina pîvanên tezmînata netewî;
  - Wek hêmaneke tezmînata bi vî awayî, sazkirina bernameyeke dem-dirêj, kordînekirî û tevahî çêbibe da ku piştgiriya tenduristî û psîkososyal ji bo zarokên ji dîlgirtina DÎ'yê rizgarbûyî yên Êzidî bê dabînkirin, li gel beşdarbûna hêzeke-peywîrdar a ku ji aliyê Gerînendehiya Giştî ya Tendurustiyê ya li Duhokê bê rêvebirin û bi tevlêbûna pardarên têkildar ên beşdar, ku tê de psîkolog û psîkoterapîst; bijîşk; xebatkarên karên civakî; xebatkarên karê mirovî; pisporên mijarên wek zarokên kirine leşker, tundiya zayendî, cinsî û tundiya li ser esasê cinsî û tundiya cinsî ya têkildarî rewşên tevlihev; û xebatkarên endamê dezgehên NY'ê yên ku alîkariyê dabîn dikin hebin; û
  - Sazkirina jêr-bernameyeke kêrhatî da ku pêwîstiyên zarokên leşkerên berê û keçikên ji tundiya cinsî rizgarbûyî bên dayîn.

## MAFÊ NASNAMEYA FERMÎ

- Serastkirin û hêsankirina barên rêveberî yên derbarê pêvajoyên bidestxistina belgeyên nû yên sivîl an jî guhertina wan ji bo hemû kesên ji ber tevliheviyên DÎ'yê hatine koçberkirin, zarokên rizgarbûyî yên Êzidî jî di nav de;
- Dabînkirina alîkariya fermî û aborî ji bo zarokên rizgarbûyî yên Êzidî da ku bikarin pêvajoya bidestxistina belgeyên sivîl timam bikin;
- Bê misogerkirin ku ji hemû koçberên li Iraqê, zarokên rizgarbûyî yên Êzidî jî di nav de, neyê xwestin ku ji bo bidestxistina belgeyên nasnameyê yên sivîl rêwîtiyê ber bi warên xwe yên berê an jî deverên din bikin ku ew wan deran wek bêewle dibînin; û

- Misoger bikin ku gîrobûna derxistina belgeyên nû ji holê rakin, da ku zarok bikarin mafên xwe yên mirovî pêk bînin wek gehîna perwerdehiyê, tedawiya tenduristî û azadiya hatin û çûnê.

# MAFÊN PERWERDEHIYÊ

- Terxankirina fonan da ku kalîteya perwerdehiya ji bo zarokên koçberkirî bê zêdekirin, zêdekirina çavkaniyên ji bo çareserkirina pirsgirêkên ji bo zarokên koçber hatine terxankirin jî tê de yên wek "kêmbûna hijmara mamosteyan û gihandina wan a ne bi têrê, kêmasiya materyalên hînbûnê û hijmarên zêde yên xwendekarên nav polan, ku di Vekolîna Pêwîstiyên Mirovî yên 2020 ji bo Iraqê de jî, ku ji hêla OCHA'yê ve hatibû amadekirin, hatine destnîşankirin;
- Berfirehkirina vebijarkên zarokên rizgarbûyî yên Êzidî ku ji bo salekê an jî zêdetir ji dibistanê dûr mane:
    - Misogerkirina vê yekê ku bernameyên ketinê yên ji bo hînbûna lezgîn ji bo hemû astên perwerdehiya seretayî û navendî pêkan bin û nebin wek tiştên acizker;
    - Misoger bikin ku bernameyên hînbûna lezgîn bi "zimanê dayîkê" yên zarokên rizgarbûyî hebin;
    - Dersên ziman bên dabînkirin, wek beşeke dibistana lezgîn, ji bo zarokên ku di dema dîlgirtinê de rastî Kurdiya Kurmancî nehatine;
    - Misoger bikin ku zarokên rizgarbûyî û xudankerên wan mecbûrî dayîna heqên hatin û çûnê nebin da ku xwe bigihînin îmkanên hînbûna lezgîn; û
    - Daxilkirina bernamekirina hêmanên psîkososyal a nav bernameyên ji bo hînbûna lezgîn ku zarokên rizgarbûyî yên Êzidî ji xwe re dike armanc.

# JINÊN XWEDÎ ZAROKÊN KU BI TUNDIYA CINSÎ ÇÊBÛNE

- Misoger bikin ku hemû jinên Êzidî yên xwedî zarokên ku bi tundiya cinsî çêbûne bi mafên xwe yên mayîna li gel zarokên xwe agahdar bin, û li gel UNCHR'ê bikevin nav hevkariyê da ku bûyerên acîl ên ji nû ve bicihkirinê an jî niştecihkirina mirovî bên kifşekirin.
- Misoger bikin ku jinên Êzidî yên ku xwedî zarokên ku bi tundiya cinsî çêbûne êdî bi zorê ji zarokên xwe neyên veqetandin;
- Misoger bikin ku jinên Êzidî yên xwedî zarokên ku bi tundiya cinsî çêbûne bikarin bi awayekî serbixwe, bi ewlehî û bêyî xetereya tundiyê di nav sînorên Iraqê de bijîn, û alîkariya aborî wergirin eger ji wan re pêwîst bike;
- Pêkanîna guherînan ji bo hemû qanûnên Iraqê yên têkildar da ku jinên Êzidî yên xwedî zarokên ku bi tundiya cinsî çêbûne di heyama dîlgirtina ji hêla DÎ'yê bikarin dînê zarokên xwe di belgeyên nasnameyên wan ên fermî de vebijêrin;
- Misoger bikin ku hemû jin û keçikên ku ji dîlgirtina vegeriyane malê bibin xwediyê timamê mafên xwe yên cinsî û yên zêdebûnê; û
- Misoger bikin ku "xizmet, alîkariya jiyanê û tezmînat ji rizgarbûyîyan re û ji zarokên bi tundiya cinsî çêbûne re bên dayîn", li gor rêziknameya girêdana hikumetê ya bi Daxuyaniya Hevpar a derbarê Astengirin û Bersivdayîna Tundiya Cinsî ya Têkildarî-Tevliheviyê ya li Iraqê ya sala 2016'an.

# JI SAZIYÊN NY'Ê Û RÊXISTINÊN NAVNETEWÎ Û NETEWÎ YÊN MIROVÎ RE KU LI IRAQÊ XEBATÊ DIKIN, Û JI TEVKARÊN NAVNETEWÎ RE

## BERPIRSIYARÎ, EDALET Û TEZMÎNAT

- Dabînkirina alîkariya teknîkî ji hikumeta Iraqê re da ku pîlansaziyeke tezmînatê ya berfireh û zayend-navend çêbike ji bo qurbaniyên tevliheviyên ku DÎ daxil bûyê, ku zarokên rizgarbûyî yên Êzidî û xudankerên wan jî te de;
- Pêkanîna beşdarbûna zarokên Êzidî yên ku ji dîlgirtina DÎ'yê vegeriyane, û her wisa yên ku niha bûne mirovên mezin lê dema zarokatiya xwe girtiyên DÎ'yê bûn, ya di nav çêkirina polîtîkayan û nîqaşên de derbarê berpirsiyarî tezmînatan;
- Pêşekîdayîna bi zarokên Êzidî di çêkirina bernameyê de, û xebata li gel rayedarên netewî da ku pîlaneke kêrhatî ya tezmînatê bê afirandin ji bo ku ji wan zarokan re derfetên tenduristiyê û piştgiriya psîkososyal bê dayîn. Wek beşeke hewldaneke wiha:

- Piştgirîdayîna bernameyên wiha da ku bikarin di dema pêwîst de bi timamê hewcehiyên zarokan çareser bikin;
- Razemeniya ji bo avakirina kapasîteyê û bernameyên akredîsyona fermî ji bo pisporên tenduristiya fermî, bi şopandina mînaka avakirina bernameya masterê ya li Enstîtuya Psîkoterapî û Psîkotrawmatolojiyê li Zanîngeha Duhokê;
- Tevkariya piştgiriyê ji bo çêkirina dahatî û îmkanên jiyanê ji bo zarokên rizgarbûyî û xudankerên wan; û
- Dabînkirina bername û xizmetên kêrhatî ji bo zarokên berê leşker û keçikên ji tundiya cinsî rizgarbûyî.

## MAFÊ NASNAMEYA FERMÎ Û PERWERDEHÎ

- Pêkanîna nirxandineke di asta-bingehîn de da ku hijmara zarokên Êzidî yên ku ji sala 2014'ê û pê de ji dîlgirtina Dî'yê vegeriyane;
- Berfirehkirina alîkariya fermî û însîyatîfên din ji bo ku zarokên rizgarbûyî yên Êzidî re bikarin belgeyên nû yên fermî yên guhertî bi dest bixin, û di ser de jî:
  - Berfirehkirina bikarananîna biryargehên mobîl û tîmên belgedayînê yên mobîl li qampên Koçberên Navxweyî;
  - Bilindkirina asta pêhisînê derbarê hebûna însîyatîfên wiha ya li qampên Koçberên Navxweyî û li bicihbûnên nefermî;
- Zêdekirina fon û çavkaniyên ku ji bernameyan re bên terxankirin ji bo hînbûna lezgîn, û di ser de jî:
  - Çêkirina kampanyayên taybet ji bo zêdekirina pêhisîna derbarê bernameyên wiha li qampên Koçberên Navxweyî û li bicihbûnên nefermî;
  - Misogerkirina wê ku nehezkirina hawirdora dibistanê ya zarokên berê leşker ku di encama tecribeyên wan ên êşkencê ên li "medreseyên" DÎ'yê de çêbûne bi pêhisîna têkildarê bernameyên wiha ji holê bê rakirin;
  - Hêsankirina barên rêveberî yên li pêş ketina nav bernameyên wiha ji bo hemû zarokan, zarokên rizgarbûyî yên Êzidî jî di nav de; û
  - Misogerkirina vê yekê ku bernameyên ji bo hînbûna lezgîn bi Erebî û Kurdî bên dayîn, da ku pêwîstiyên zarokên rizgarbûyî yên ku ji dîlgirtinê vegeriyane û êdî bi awayekî herikbar Kurdî nizanin bên çareserkirin.

## JINÊN XWEDÎ ZAROKÊN KU BI TUNDIYA CINSÎ ÇÊBÛNE

- Misoger bikin ku, li gel tevkariya bi rayedarên netewî, hemû jinên Êzidî yên xwedî zarokên ku bi tundiya cinsî çêbûne yên ku li qampên penaberan li Suriyê û li qampên Koçberên Navxweyî û deverên din ên Iraqê dijîn bi mafên xwe yên mayîna li gel zarokên xwe agahdar bin;
- Pêşekîdayîn û zûka-şopandina bicihkirina jinên Êzidî yên ku dixwazin bi zarokên xwe yên ku bi tundiya cinsî çêbûne bijîn. Wek beşeke wan hewldanan:
  - Misogerkirina vê yekê ku endamên malbatên wan jinan ên ku dixwazin terka Iraqê bikin ji bo bicihkirinê bibin xwedî pêşekî, ji ber sedema rîsk û şerma ku dibe ew rû bi rû bimînin;
  - Pêkanîna kampanyayên pêhesandinê li qampên wek al-Hol a li bakur-rojavayê Suriyê derbarê tercîhên ji bo yekbûna malbatî, bicihbûn û ji nû ve bicihkirina mirovî;
- Teşwîqkirina wan dewletên ku beşdarî ji nû ve bicihkirina bernameya UNCHRê dibin da ku asta girêdana xwe ya bi pêkanînên ji nû ve bicihbûnê bilind bikin, yên ji bo zarokên bi tundiya cinsî çêbûyî û dayîkên wan ên Êzidî jî di nav de;
- Avakirina rêxistinekê an jî bernameyeke pisporiyê li ber çav bê girtin ku bala xwe bide ser vê pirsgirêkê li gel xebatkarên li Suriyê, nêzikî qampên penaberan, û li walîtiya Duhokê ya li HK-I'yê; û
- Dabînkirina "xizmet, alîkariya jiyanê û tezmînatê ji bo rizgarbûyîyan û ji bo zarokên bi tundiya cinsî çêbûne, li gor rêziknameya girêdana Temsîldarê Taybet ê NY'yê yê ji bo Sekreteriya Giştî ya derbarê Tundiya Cinsî ya li nav Tevliheviyê, her wekî bi Daxuyaniya Hevpar a derbarê Astengirin û Bersivdayîna Tundiya Cinsî ya Têkildarî-Tevliheviyê ya li Iraqê ya sala 2016'an hatiye destnîşankirin.

# AMNESTY INTERNATIONAL IS A GLOBAL MOVEMENT FOR HUMAN RIGHTS. WHEN INJUSTICE HAPPENS TO ONE PERSON, IT MATTERS TO US ALL.


## CONTACT US

info@amnesty.org

+44 (0)20 7413 5500

## JOIN THE CONVERSATION

www.facebook.com/AmnestyGlobal

@Amnesty

INDEX: MDE 14/2759/2020
JULY 2020
LANGUAGE: KURMANJI KURDISH

amnesty.org

AMNESTY INTERNATIONAL